Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1259 | 26-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Sûretên zimanên jibîrçûyî




Navenda Nûçeyan

Wênegirê bi navê BA Van Sise ku li Emerîka dijî bi projeyeke cuda daye pey zimanên hatine jibîrkirin. Wî li gelek herêmên Emerîkayê sûretên kesên niştecih ên ku hewl didin zimanê xwe biparêzin girtine. Di van rojên ku li Emerîkayê xelkên xwecih û zimanê wan her roj bêhtir tên jibîrkirin de, wênegirê bi navê BA Van Sise mohra xwe li xebateke gelekî girîng xistiye. Ji bo ku karibe li zimanên tên jibîrkirin bikole li seranserê welat geriyaye û wêneyên kesên ku bi van zimanên tên jibîrkirin re xebitiye. Wî rûyê van kesan bi konseptên cuda girtiye û albomeke xweşik ava kiriye di vî warî de. Piştî ku xebata xwe bi dawî kiriye bi wêneyên ku girtiye pêşangehekê jî vekiriye û her wiha wêneyên xwe weke albomekê jî daye çapkirin. Ji bo ew vê xebatê bibe serî 3 salan xebitiye û li gelek herêmên Emerîkayê wext bihurandiye.

BA Van Sise navê “On the National Language: The Poetry of America’s Endangered Tongues” (Li Ser Zimanên Neteweyî: Helbesta zimanên di bin talûkeyê de yên Emerîka) li pirtûk û pêşangeha xwe kiriye. Wî qederê 80 wêneyên xelkên ku bi van zimanên di bin talûkeyê de diaxivin girtiye. Her wiha di derbarê her zimanî de agahiyan jî li albomê ango pirtûka xwe zêde kiriye. Wekî din wî behsa serpêhatiya 9 kesên ku hewl didin zimanê wan jibîr nebe jî kiriye û bi vî awayî behsa dîroka Emerîkayê kiriye. BA Van Sise dide zanîn ku xelkên xwecih bi zimanên xwe serbilind in û ji bilî serbilindiyê ew bi awayekî çalak ziman diparêzin jî. Pêşangeha BA Van Sise di 17’ê vê mehê de (îro) li “Skirball Cultural Center” a li Los Angelesê vedibe. Ew bi vê pêşangehê dixwaze xelk van zimanên jibîrçûyî meraq bikin û zanibin gava ev ziman hatin jibîrkirin ew ê Emerîka di warê çandî de feqîrtir bibe.

**Kesên ziman diparêzin hevdû nas dikin**

BA Van Sise li Oklahomayê kesekî ku di hewla parastina zimanê xwe de ye nas dike û pişt re jî ev mesele jê re dibe meraq. Ew dixwaze bi rêya wêneyan rûyê van kesên ku hewl didin zimanê wan neyê jibîrkirin nîşan bide. BA Van Sise ji bo projeya xwe got; “Projeya min ji fikrên mêtingeriyê yên kevn bêhtir li ser insanên ciwan û siberojê ye. Lê ji vî tiştê jî girîngtir; kesên ku di hewla parastina zimanê xwe de ne û nahêlin zimanê wan were jibîrkirin hay ji hevdû hene û hevdû nas dikin.” Ji xwe piştî hevdîtinê bi kesekî re dike ew kes wî bi gelek kesên din re jî dide nasîn û naveroka projeyê bi vî awayî xurtir dibe. BA Van Sise jî derdikeve dervayî sînorên konfora xwe û heta jê tê diçe cihên dûr û xwe digihîne zimanparêzan û wêneyên wan ên xweşik digire.

**Ji bo ciwanan û nifşên nû**

BA Van Sise bi vê projeyê herî zêde dixwaze bala ciwanan ango nifşên nû bibe ser van zimanên ku her roj hinek din tên jibîrikirin û dibêje; “Divê em ji wê çanda ku tenê li jiyana xwe ya kesane difikire dûr bikevin. Ev hişmendiyeke ne baş e. Divê em têbighîjin ku hemû çand bi hevdû ve girêdayî ne û dewlemendiya civakê ne. Ji xwe dîrok û siberoja me jî bi hevdû ve girêdayî ye. Ji lewma herî zêde jî dixwazim ciwan vê projeyê bibînin û fam bikin ku ev çandên dewlemend gelek qalibên heyî şikandine. Bi hêviya ku di feraseta nifşê nû de di derbarê zimanên tên jibîrkirin de tiştekî bi cih bikim û çirûskekê vêxim. Ew dikarin fêrî van zimanan jî bibin û hay ji van çandên dewlemend hebin. Ji lewma her çandek dinyayeke cuda ye.”

Di pêvajoya vê projeyê de hin zehmetî jî derketin pêşiya BA Van Sise. Gava ew li Pennsylvania dixwaze wêneyê Sylvan Esh bigire, nikare wisa bi rehetî bigire. Ji bo ku dilsoziya xwe nîşan bide û xelkên li wir jî pê bawer bibin hewcebû ku 4 rojan li çewliga wan bimîne û xwe bide qebûlkirin. Piştî çar rojan dikare tenê wêneyekî bigire û ev wêne jî ji paş ve hatiye girtin.

## Kêrên kevir ên 80 hezar salî hatin dîtin

Navenda Nûçeyan

**Lêkolînerên li zanîngeha Friedrich Schiller ya li Almanyayê, li herêma Cebet Faya ya li Emirtiya Şarja ya Yekîtiya Emirtiyên Ereb, kêrên kevir ên aydî beriya 80 hezar salan, dîtin.**



Lêkolînerên li zanîngeha Friedrich Schiller a li Almanyayê, li herêma Cebet Faya ya li Emirtiya Şarja ya Yekîtiya Emirtiyên Ereb, kêrên kevir ên aydî 80 hezar sal berê hatine çêkirin dîtin.

Li gor lêkolînên nû yên hatin kirin, tê payîn ku ev amûrên kevir, ji aliyê Homo Sapiens ve hatine çêkirin. Nîşane diyardikin ku mirov ji Efrîqa derketine û dema em bifikirin ku ketibe nîvgrava Ereb gelek zûtir xwe gihandine.

Lêkolîneran diyar kirin ku ev kevir aydîdê Serdema Kevir a Navîn e. Daneyên kronolojîk ên di kolanên Cebel Faya de hatin bidestxistin, li herêmê bicîhbûna mirovê herî dawî, dighê beriya 80 hezar salan. Ev keşif têkildarî riyên koçberiya mirovan û dîroka bicîhbûnê agahiyên girîng pêşkêş dike. Zanyar difikirin ku nîvgirava Ereb, ciyê ku mirovên modern ên ji Efrîqayê tê re derbas bûne ye. Encamên lêkolînê, nîşan dide ku teoriyên hêzên zû yên mirovî divê ji nû ve bên nirxandin.

Bi kamîreya Hemza Sêvo



## FERHENGA BIWÊJAN

**Hevîrê teştekê ne:**
- Taybetiyên wan yek in; weke hev in.

**Ji bêvila bavê xwe ye:**
- Bi her tiştê xwe ve weke bavê xwe ye.

**Ku te da avê, ha li çokê, ha li navê:**
- Piştî ku tu tevlî bûyî, ha hindik ha pir.

**Ma dar tehl e, berê wê şîrîn e?**
- Ku baş bin her du baş in, ku xirab in jî her du xirab in.

**Mûyek jê bernedaye:**
- Bi her tiştê xwe ve weke wî ye; pir bi ser ve diçe.

**Mûyek jê kêm nehiştiye:**
- Bi heman wateyê.

**Mûyek jê nehiştiye:**
- Bi heman wateyê.

**Ne bist bişewite ne kebab:**
- Bila her du alî jî zererê nebînin.

**Pincara heman çiyayî ne:**
- Tev weke hev in; ti ferq di nava wan de nîne.

**Pîra Şamê tibayî amê:**
- Ez jî weke her kesî; ka her kes çawa be ezê jî wisa bim.

**Pîra Şamê tevî amê:**
- Bi heman wateyê.

**Pîvaz pîvaz e çi sor e çi spî:**
- Her du jî weke hev in.

**Qumaşê wan hev digire:**
- Weke hev in; heman tişti in; weke hev dihizirin.

**Qumaşê wan yek e:**
- Bi heman wateyê.

**Ser hev ve ne:**
- Li gorî hev in; bi hev dikin.

**Serê pîvazê û binê pîvazê yek in:**
- Her du weke hev tin; ferq di navbera wan de nîne.

**Se se ye çi reş çi spî:**
- Her du jî weke hev in.

**Te daye avê, ha li çongê ha li navê:**
- Piştî ku tu tevlî bûyî, ha hindik ha pir.

**Tevan di rêzekê de diajo:**
- Hemûyan weke hev hesab dike; bi çavekî li hemûyan dinêre.

**Wî lingek hildaye yê din lingek daniye şûnê:**
- Di her tiştê xwe de weke hev in.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Emîna Osê: Xebatên dîplomasî garantiya mafê jinê ye



Berpirsyara Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîna Osê diyar kir ku bi xebatên dîplomasî xebatên hevbeş ên jinan li hemberî zihniyeta ku dijbertiya jinê dike, pêk tê. Herwiha bi xebatên dîplomasî balkişandina jinên cîhanê li ser sîstema xweseriya jinên Rojava pêk hat.**R-2**


## ‘Pêwîst e dewleta Tirk di warê çareseriyê de gavên pratîkî bavêje’



Rojnamevan Rohat Bulut diyar kir ku ji bo demokrasî û çareseriyê pêwîst e dewleta Tirk guh bide banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha got: “Ya girîng ew e ku divê dewlet û desthilatdariya Tirk di warê çareseriyê de gavên pratîkî bavêje.”**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1259 | 26-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Berxwedana Hefteya Lehengiyê çirûska azadiya gelê kurd e



Pêşengên Tevgera Azadiya Kurdistanê, ji 21 heta 28’ê Adarê navê xwe di dîoka têkşênê de dane nivîsandin û dîrok dane guhertin. Ew zarokên gelê Arî bûn, Ji gelê xwe re xizmet kirin û heta roja me ya îro bi rihê wan têkoşîna azadiya Kurdistanê didome.R-6


## Ji çiraxên wêjeya kurdî



Beşîra Derwîş bi xeyalên xwe yên xemgîn û gerok, bi zimanekî xweş, sade, xeyalî helbestên hêja dinivîse û ji me re cîhanek tijî jiyan û mirovahî xêz dike, cîhanek ku em tê de wateyên herî bilind derbas dikin, di gel hemû neheqiyên ku ew bêdeng dikirin.**R-7**

# HEVPEYMAN MISOGERIYA SIBEROJA SÛRIYÊ YE

Li ser bingeha avakirin siberojeke demokratîk ji bo gelên Sûriyê û misogeriya mafên hemû netew, ol û pêkhatiyan, herwiha rawestandina tevahî êrişên li ser xaka Sûriyê, di 10’ê Adara 2025’an de Fermandarê (QSD) Mazlûm Ebdî û serokê desthilata Şamê Ehmed El Şeri peymanek ku ji 8 xalan pêk tê, imze kirin. Di 19’ê Adarê de jî Mazlûm Ebdî bi komîteya ku Ehmed El Şeri ava kiriye re civiya û mekanîzmeya xebata komîteyan hat nîqaşkirin. Gelên Sûriyê hêvî dikin ku ev hevpeyman bighêje serî û ji bo siberoja Sûriyê bibe bingeh.**R-3**




## Pêvajo, Fikar û Erk



Pêvajoya guhertin û veguhertina ku piştî Banga Aşitî û Civaka Demokratîk a Rêber Apo dest pê kir, derbasî qonaxeke nû bû. Li çar aliyên Kurdistanê di qadên Newrozê de gelê kurd xwedî li vê bangê derketin û piştgiriya xwe bi Rêber Apo re ragihandin. Ev piştgirî û xwedîderketin, destpêkirina pêvajoyekî nû ye.**R-4**

Bila komkujî neyê jibîrkirin — Nehîr pale — R-2
Civakên Rêxistinkirî dikarin demokrasiyê ava bikin — Zekî Bedran — R-5

Rêbertî tiştek wiha ye! — Farûk Sakik — R-5

Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan 5 salên xwe temem kirin — Kemal Necim — R-7

# Emîna Osê: Xebatên dîplomasî garantiya mafê jinê ye

Berpirsyara Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîna Osê diyar kir ku bi xebatên dîplomasî xebatên hevbeş ên jinan li hemberî zihniyeta ku dijbertiya jinê dike, pêk tê. Herwiha bi xebatên dîplomasî balkişandina jinên cîhanê li ser sîstema xweseriya jinên Rojava pêk hat.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê kar û xebatên dîplomasiya jin, berpirsyara Komîteya Têkiliyan ya Kongra Star Emîna Osê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di gelek kar û xebatan de jin pêşengtiyê dike, yek ji van karan jî xebatên dîplomasî ye, dîplomasîya jin li ser çi bingehê xebatên xwe dide meşandin? Û xebatên dîplomasiya jinên Rojavayê Kurdistanê çi bandor li ser jinên cîhanê kir?**

Em weke Komîteya Têkiliyên Kongra Star giranî didin xebata xwe ya dîplomasî, têkiliyên civakan bi hev re xurtkirin û têkiliyên rêxistinên jin di hundir Sûriyê, Rojhilata Navîn û derve re. Bi armancên ku em hemû rêxistinên jin karibin sîstemeke konfederal ji bona dozên hevbeş ê jinan, ava bikin. Gelek pirsgirêkên ku me jinan tîne cem hev û dihêle ku em li ser bingehekî konfederal kar bikin, hene. Yek jê li hemû welatên Rojhilata Navîn de, sîstemên netewperest ê ku çê bûne, di bingeha xwe de bi destê zilam tê birêvebirin, xwedî hişmendiyekî zayînperestî ye, ev mijarekî girîn e ku jinan tîne gel hev. Di heman demê de destûra wan a ku pişta xwe didin olan, cih û erkê jinê weke civak nabînin, em jî têkoşîna wê dikin. Ji ber ku di van welatan giştî de encamê hişmendiya dewletên netewperest, dûrkirina û biçûkirina rola jinê dike.

Heman demê hişmendiya zayendperestî dixwaze dûrxistina jinê ji cihê ku tê de hevkarê biryargirtinê be, qadê ku jin pê hêz bibe, milê siyasî, dîplomasî, leşkerî û hwd…bike. Heta di astên civakî de jî gelek zagonên ku jinê dixe bin qeyd û sînoran de çêkirine, em têkoşîna vê jî dikin. Encamên van zihniyeta jî şidetekî civakî û piskolojîk heye. Lewra bi hevgirtinekî rêxistinên jinan ku bi hev re têkoşînkirin di milê qanonî, siyasî û dîplomasî ya li hember vê zihniyetê û hizra ku jinê di asta jêr de dibîne.

Di Rojava de jinên pêşengtiyê di aliyê têkiliyan de dike, bala jinên cîhanî û rêxistinên jinan kişandina ser têkoşîna jinên Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û sîstema wê ya xweser a di qadê civakî, siyasî, aborî û hwd…. Ev jî nimûneyeke ku hemû jin ji xwe re bingeh bigirin, da ku destkeftî yan jî mafê xwe di her sîstemekî de bikin gin gerantiyê de. Herwiha dîplomasiya jin di Rojavayê Kurdistanê de, dixwaze bi hemû jinên welatên Rojhilat Navîn û derve re, di milê zanistî, xurtkirin û tecrûbeyên xweparvekirin de, xebatên hevbeş li hemberî zihniyeta ku dijbertiya jinê dike, bide meşandin.

**Girîngiya xebatên dîplomasî çi ye? Herwiha şoreşa Rojava ji bo xebatên dîplomasiya jin derfeteke çawa bû?**

Şoreşa Rojava di bingeha xwe de bi şoreşa jinê naskiriye. Herwiha bi feraset û bi felesefeya Jin, Jiyan, Azadî îro jina kurd li her qadekê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cihê xwe girtiye, ne bi rengê teşe û wêne. Lê bi deng, reng û biryardariya xwe. Ev dihêle ku teysandinekî proja demokratîk a ku pêşengtiya wê di hemû qada de jine, ji derve re cihê balkêşiyê be. Li ser vê balkêşiyê jî îro bi 100'an jin ji Rojhilata Navîn û derveyî Rojhilata Navîn berê xwe didin Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rohilatê Sûriyê û tecrûbeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di gelek mijara de meraq û lêkolîn dikin. Da ku vê modêlê derbasî welatê xwe bikin û têkoşîna xwe xurt bikin.

**Ji bo ku destkeftiyên şoreşa Rojava û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê were parastin erkê dikeve ser milê dîplomasiya jin çi ne?**

Tecrûbeyekî 13 salan a şoreşa Rojava heye. Di van 13 salan de bi pêşengtiya jin civak hat birêxistinkirin. Di heman demê de jinê bi rêjeya 50 ji sedî di hemû qadên jiyanê cihê girt, sîstema hevserokatî bingeh girt. Bi van destkeftiya jin hebûna xwe îfade kir. Êrişên ku îro bi rengê siyasî ji aliyê dewletên cîran ve pêk tên, sedem ew e ku naxwazin sîstemek demokratîk pêş bikeve û tecrûba Rêveberiya Xweser jî biser nekeve.

Li ser vê bingehê erkê ku dikeve ser milê jinê ew e ku modêla xwe ya xweserî ya jin li hemberî van lîstokan pêş bixe. Herwiha parastina wê di milê siyasî, qanûnî, dîplomasî û hwd… gelekî girîng e û ji bona Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî wekî sîstemî ku di nava peymana xwe de mafê jin misoger dike.

Têkoşîn gelekî girîng e ji bo ku em îro sîstema xwe ya xweser pê biparêzin. Di heman demê demê jin hêmanekî bingehe ku alîkare bi parastina sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Jin di hemû qada li hemberî hemû êrişên ku li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên kirin, berxwedanekî dîrokî dike. Îro êrişên leşekerî yên li ser Bendava Tişrînê bi pêşengtiya jin li pêşe.

Herwiha pêwîst e jin li hemberî destûrekî ku hatiye ragihandin û tu mafê jinê û gelê wê pênase nakî, berpirsyariya xwe li hemberî redkirina vî destûrê ne demokratîk, bi berpirsyarî tev digere, li hemû qada bertekê yê xurt û bi israrekî mezin ku têkoşînê bilind bike.

Ya herî girîng jî ew e ku ev pêvajo gelekî girînge weke pêvajoyekî pêşerojê ji bo gelê kurd bi taybetî jin. Hem jî derfeteke mezine. Lê li kêlek wê gelek pirsgirêk hene û ji bo ku em van astengî û pirsgirêkan derbas bikin, me konfransa netewî ya jinên kurd lidar xist. Bêguman yekîtiya jinên kurd jî nabe zirar ji bo tu pêkhateyên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, berovajî wê sîstema hevgirtina civakî ya bin siya Rêveberiya Xweser de xurt dike û heman demê de pêşengtiyê dike ji bona kongrê kurdî yê netewî.

**Jin di xebatên dîplomasî de rastî çi astengiyan tê û çawa dikare van astengiyan derbas bike?**



Astengiyên ku di xebata dîplomasî de derdikevin. Yek jê pisgirêkên mezin siyasetên ku îro li ser bingeha berjewendiya dûrî exlaq tê meşandin û bandora wê ya ku li jinê dike, jin dibe qurban, penaber dibe û tê çewsandin. Herwiha şerê ku hîna li Sûriyê dewam dike û li ser herêma me jî bi taybet, di heman demê de li herêma beravê komkujî û binpêkirinên ku çêbûne, encama zihniyeta cîhadperestiya ku kete şûna Baasê de. Ev jî pirsgirêkeke nû ku hat pêşiya jinê. Di heman demê de yasaya ku qaşo ji bo Sûriyê ye, lê di bingeha xwe de aramî û demokrasiyê pêş nexe. Tersî wê destûrekî inkara û nedîtina rasiya Sûrî hem demokratîf, hem pirengiya wê neberçav girtine. Ev yek wê ne aramiyê pêk bîne, lê wê şer gurtir bike.

Herwiha pirsgirêkên din rewşa aborî, lîstokên ku li ser Sûriyê heyî û taybet milê dwleta Tirk de ya ku agirbestê pêk nayîne û ne jî destê xwe ji Sûriyê dikşîne. Ev hemû li ser bingeha ku çawa karibin Sûriyeke ne demokrat ava bikin, herwiha rola jin û pêşengtiya jin bê temsandin.

Lê bê guman ji bo ev astengî bên rawestandin, em jinên kurd bangewaziyên ji bo rawestandina şer li Sûriyê giştî dikin. Hem ji bo jin di hemû qadê jiyanê de cih bigire, komîteyên ku tên çêkirin rewşa Sûriyê tê nîqaşkirin ji bo pêşerojê gerekî rêjeya jin ji sedî ne kêmî 50 be.

Ya ku em karibin bi hevre van astengiyan derbas bikin hevgirtina me jinên Sûriyê ye. Helwestbûna ku yek dengî li hemberî siyasetê yekrengî bikin. Bi hevgirtina jinên kurd, ereb, elewî, dûrzî, suryan, çerkez û hemû jinên pêkhateyên din ew tenê garantiya ku em karibin bibin hêzekî bandor ji bo guhertin û veguhertinên di Sûriyê de, bike.

## Ji Pênûsa Jin

### Bila komkujî neyê jibîr kirin

**Nehîr Pale**

Di navbera komkujiya 25`ê Hezîrana sala 2015`an û komkujiya 15`ê Adara sala 2025`an cûdayî nîne. Çeteyên DAIŞ`ê roja 25`ê Hezîranê ber bi sibehê ve ketin gundê Berxbatan û bajarê Kobanê. Li pêşiya xwe kî dîtin kuştin û ketin malan zarok, ixtiyar, jin û mêr dan ber gulan. Mîna ku tola sedê salan ji gelê Kurd digrin, bi hovîtî kuştin û serjêkirin. Li pey vê komkujiyê ji derveyî kesên ku şehîd ketin gelek kes seqet man û zarok bê dayîk û bav man. Niha temenê wan mezin bûye, 11 sal li ser komkujiya 25`ê Hezîranê re derbas bû, lê nayê jibîr kirin. Hemû kesên ku bibûn şahidê vê komkujiyê wan kêlî, saet û rojên komkujiya 25`ê Hezîranê jibîr nakin. Narîn Ebdo şahida komkujiya 15`ê Adarê ye lê ew bi tenê ye û yên di komkujiyê de şehîd bûn, xwişk, dayîk, bav û birayên wê bûn.

Roja şemiyê 14`ê Adarê saet 11:45 balafirên dewleta Tirk a dagirker mala Osman Ebdo bombebaran dikin. Ew li mezreyeke başûrê Kobanê di navbera gundê Qumçî û gundê Berxbatan de dimîn in. Ew malbata ji bo debara jiyana xwe bike, li wê mezreyê dixebitîn. Hejmara wan 11 kesin, keçika herî mezin Ronîda 19 salî ye û Avesta jî 8 mehî ye.

Piştî balafir ciyê wan bombebaran dike, tenê dîwarekî mala wan tê xwarê û ew ji bo neyên kuştin hemû di bin balafirên keşfê de direvin doleke piçekî ji mezreyê dûr e. Balafira şer dîsa li wan dixe û ji malbatê 9 şehîd dibin, Ronîda keça mezin û Narîna 8 salî jî birîndar dibin. Piştî lêdana wan êdî destpê dikin hemû gund û erdnîgariya derdora wan topbaran dikin. Ji ber balafirên keşfê digerin û bi dijwarî her deverê topbaran dikin, kesek nikare biçe ciyê malbata Osman Ebdo û bi wan re bibin alîkar. Rêbazên dewleta Tirk a dagirker ên pêkanîna wê komkujiyê ji rêbazên çeteyên DAIŞ`ê yên 25`ê Hezîranê pêk anîn ne cûda ne.

Duh 18`ê Adarê bi hezaran gelê Kobanê tevlî merasîma cangoriyên komkujiyê bûn. Cenazaya dayîk, bav û zarokan rêz kiribûn û li gel hevdû spartin axê. Di heman rojê de Ronîda ku giran birîndar bibû, şehîd bû û di 19`ê Adarê de ew li gel dayîk, bav, xwişk û birayên wê spartin axê. Tenê Narîna 8 salî ma ye.

Gelê Tirk dibe ku ji dîroka xwe şerm bike; desthilatiya vê demê mîna desthilata berî xwe komkujiyan dike. Dîrokeke wan a gelekî bixwîn û gemar heye, ev têrê dike ku dewleta wan hov û paşverû were naskirin.

Dewleta Tirk a dagirker ne ji şer û ne jî ji aştiyê fêm dike. Di pêvajoya guhertin û veguhertina demokratîk a ku Rêber Apo destpêkirî komkujî pêk anîn. Ew malbat ne leşker û ne jî li eniyê bûn. Di çandiniyê de dixebitîn da ku pêdiviyên xwe pêk bîn in. Bila ev komkujî neyê jibîr kirin; 7 jin di wê komkujiyê de hatin qetil kirin. Şehadeta wan dilê gelê Kurd birîn kir û mîna komkujiya 25`ê Hezîranê ev birîn wê her tim di salvegera xwe de xwîn bibe.



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvana Kurd Beşîra Derwîş Dengê jina Kurd a wêrek û azad. Jin, ji helbestvana Sumerî Inxîdona dest pê dike û heta dighêje bi nifşa jinên afirîner ên hemdem ên welatê me Kurdistanê, ew helbestvaneke afirînere û nivîskareke hêja ye.

Alavên curbecur ên medyaya civakî hiştiye ku jina torevan nivîsên xwe ragihîne û bibe dengek ku li seranserê cîhanê bête bihîstin, dengê wê bilind dibe li hemberî hemû diyardeyên zordestiyê û pênûsa wê derbirîna azadî û daxwaza rizgarbûna xwe dike ji hemû peymanên kevnare, ji ber vê yekê, ew têkoşîn dike û li ber xwe dide û bi azadî dinivisîne, bêyî ku bibe koleya kesekî,heya ku dilopek xîmav ji pênûsa wê biherike.

Gelek helbestvan û nivîskarên jin ên kurd hebûn ku ji pênûsa wan xîmav diherikiya ji bo ku di derbarê civaka xwe de bîr û ramanê xwe bînin ziman, di gel hemû şert û mercên dijwar jî ew berdewam bûn binivîstandina bi pênûsa xwe, ku xizmeta ziman û wêjeya (edebiyata) kurdî bikin, li dijî înkarkirina nasnameya kurdî têkoşînê bikin, mîrateya çandî û zimanî ya kurdî biparêzin, wan karîbûn navên xwe di nav civata wêjeya kurdî de bi tîpên zêrîn xêz bikin û di cîhana nivîskarî û helbestê de şopeke girîng bihêlin, di nav wan de helbestvan û nivîskar û Haykonûsa kurd Beşîra Derwîş jî heye ku di vê qonaxa niha de stêrka wê li esmanê edebiyat û çanda kurdî şewq daye.

Helbestvan, nivîskar, çîroknûsa Kurd Beşîra Derwîş di sala 1969'an de li bajarê Qamişlo ji du dê û bavên Kurd (Mihemed û Hadiya) di nava malbateke Kurd a welatparêz de ku bi ruhê berxwedaniya netewî û hesreta azadiyê tijî bûye, hatiye dinya yê.

Ew di 7'ê Tebaxa 1987'ê de zewicî ye û dayika pênc zarokan e (sê kur û du keç).

Dibistana seretay, amadeyî û lîse li bajarê Qamişlo xwendiye û piştî



wergirtina bawernameya amedayî, li kulîjeya wêjeyê di beşa Felsefeyê de xwe tomar kiriye, ji ber zextên ewlehî û siyasî û şert û mercên jiyanî û malbatê xwendina xwe ya zanîngehê temam nekiriye.

Meyla wê ya wêjeyî û hezkirina xwe ya ji bo nivîsandina helbest, nûşe û çîrokan di temenekî biçûk de dest pêkiriye di dema xwendina xwe ya di qonaxa dibistana navîn de, bi nivîsandina hizrîn û rojnivîsên xwe yên rojane, piştre jî dest bi nivîsandina helbest û kurteçîrokan kiriye, lê ji ber sedemên kesayetî (şexsî), siyasî û yên din ewê tenê ji xwe re dihiştin. piştî wê ew bi navên nenas di rojname û kovaran de weşandine

Paşê jî ew hatine weşandin di malpêreke ne nasnav de, lê ew hate hekirkirin, Piştî wê yekê wê bi tevahî xwe terxan kir ji karên nivîsandina helbest, gotar û çîrokan re.

Beşîra Derwîş helbestvaneka afrîner e ku helbestan bi zimanê erebî û kurdî yên petî dinivîse û bi şêwayekî klasîkî û terazû, bi awayekî pexşan û xurt û helbestên hayko yên hêja dinivîsîne, helbestên wê bi hesteke bilind û afrîneriyeke mezin diyar dibin, ew xwedan jêhatîbûnek bilinde ku bi helbestên xwe yên xweş û nivîsên xwe yên hêja peyaman vediguhezîne û ramanan rasterast radighîne dilê mirovan, îlhamê dide mirovan û wan teşwîq dike ku bigihîjin armancên xwe û xewnên xwe pêk bînin.

Ew bi xeyalên xwe yên xemgîn û gerok, bi zimanekî xweş, sade, xeyalî helbestên hêja dinivîse û ji me re cîhanek tijî jiyan û mirovahî xêz dike, cîhanek ku em tê de




wateyên herî bilind derbas dikin, di gel hemû neheqiyên ku ew bê deng distîne jî, mîna keçên me yên din, ew dixebite û amade dike ku ji bo me helbestên xweş, awazên melûl pêşkêşî me bike û herwiha ew ji me re bi gotinên xwe yên sade, birîndar, rêyên pêşveçûna li ser rêya mirovatiyê û yekîtiya bi qenciyê re xêz dike.

Beşîra Derwîş ji bo xwezaya bedew a Kurdistanê, ji bo azadiyê, ji bo jinan, ji bo zarokan, ji bo Kurdistanê, ji bo parêzvanên axê, ji bo êş û derdan, ji bo bendewariyê, ji bo hesreta di dilên tî de, ji bo jiyanê, ji bo evînê, ji bo hezkirinê, ji bo hesretê, helbest nivîsîne, gotinên wê li ser jiyanê pir xweş in, û tîpên wê hêsanin, lê ew gelek wateyên bedew hildigirin û bandorê li ser dilan dikin, hûn dikarin wan fêm bikin û tiştên ku hûn bi wan hîs dikin diyar bikin, gotinên wê birînan derman dikin, giyanan şa dikin û dilan xweş dikin.

Ji berhemên wê yên edebî yên çapkirî ev in:

- Berhevoka helbestan, ya yekem bi erebî (Keça Rojê) ye di 2018'ê de hatiye çapkirin.

2-Komek kurteçîrokên bi zimanê kurdî bi navê (Marên di hêlînên kevokan de) di 2019.

3-Berhevoka helbestan bi zimanê kurdî bi navê (Buxçika hêviyan), di sala 2020 de.

4-komeke kurteçîrok bi navê (Pêl û dûman) di 2020 an de.

5-Pirtûkek helbestên Hayko bi navê (Refên xewnên firyayî) di 2021 li Tehranê hatiye çapkirin.

6-Pirtûkeke hevbeş ya helbestên erebî û wergera amazîxî bi navê "Dewata pakrewana" di sala 2021 li Bexdayê hatiye çapkirin.

7-Berhevokek ji helbestan bi navê (Hezar û Yek Hayko) beşa yekem di sala 2024'an de li Misrê hatiye çapkirin.

Herwiha çend Ontolojiyên hevpar ên ku hatine çapkirin jî hene

Wek ontolojiya helbesta nûjen li Rojava (bi kurdî) û helbesta femînîst a kurdî ya helbestvanên jinên kurdên sûriya û antolojiya ku helbestvanên ji Kurdistana Iraqê, Sûriyê û Emazîx têde cih digirin û ew xwedî şans bû ku li kêleka nivîskarê navdar ê navneteweyî Şêrko Bêkes û yên din cî bigire .

Jînenîgariya wê û çend berhemên wê yên wêjeyî hatine daxistin li gel hejmarek ji nivîskaran di bergîna (cildê) heştan de ya Pirtûka nivîskar Necmedîn Îsmaîl Sumeîlî ji Iraqî ve, ku tê de 70 nivîskar û kesayetiyên naskirî hene, bi navê (Ez û Stêrên Ronahî).

Gelek helbest û nivîsên xwe di malpêrên elektronîk û kovarên edebî de weşandine û gelek xelat wergirtine û hin ji wan bi çend zimanan hatine wergerandin.

Ji bilî beşdarbûna dîwanên wê yên helbestan û nivîsarên wê yên edebî di pêşangehên navdewletî û herêmî de, gelek xelat û bawernameyên spasdariyê û rêzgirtinê wergirtine, wek beşdariya dîwana wê ya helbestan (Keça rojê) û pirtûka wê (Marên di hêlînên kevokan de) û berhevoka wê ya helbestên Hayko (Refên xewnên firyayîn) li pêşangeha navdewletî ya Hawler û pêşangeha Herekol li Qamişlo hate pêşkêş kirin û wan bawernameyên pesindan û afirînerî yê wergirtin.


Ji bilî wergirtina gelek xelatan ji bo nivîsên xwe yên haykoyê ji yaneyên erebî û yên din, û weşandina wan di kovara "Peyv û Evro" de li ser malpêra Badînan, herwiha wergirtina wê bawernameya doktoraya rûmetê ji Akademiya Helbestê li Holendayê, kovara El-Esala ya wêjeya Erebî.

Ew endama Yaneya (Kulûba) Erebî ya haykoyê ye li (Muxrib, Misir û Ûrdinê) ye û serpereştiya kovara Hilda Hayko ye dike û endameke çalak û bibandor bû di beşdarbûna şevbuhêrkên helbestan û festîvalên wêjeyî û çandî yên ku di van salên dawî de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine lidarxistin.

Di karê wêjeyî û çandî de jê re serkeftin, afirînerî û geşbûna zêdetir dixwazim.




## Têbînî



### Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan 5 salên xwe temem kirin

**Kemal Necim**

Piştî çend rojên din, di 29`ê Adarê de dê encamên Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan bêne eşkerekirin. Pêşbirka îsal ya sala 5`emîn e. Dîse bi dehan ciwanên Kurd dê têkevin hevrikî û pêşbirka peyva resen a kurdî.

Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan cara pêşîn di sala 2021`an ji hêla Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê û bi sponseriyê Komeleya Janê Xelef a Xêrxwziyê li Ingilistanê hate lidar xistin. Di pêvajoya 5 salan de bi sedan ciwan berşdarî pêşbikê bûn û helbestên xwe pêşkêş kirin. Di encama pêşbirkan de her sal xwediyên sê helbestên herî baş têne xelatkirin. Xelatên pêşbirkê jî diravî ne.

Armanca pêşbirkê ya sereke ku ciwanên Rojavayê Kurdistanê têvedin qada derbirîn û afrêneriya wêjeyî ya bi zimanê kurdî.

Weke tê zanîn ku bi salan nifşên ciwan li derveyî qada afrêneriya wêjeyî ya bi zimanê kurdî mabûn. Ji ber qedexe û çewisandina li ser çand û zimanê kurdî derfeteke berfereh ya ciwan tune bû ku bi zimanê xwe yê dayikê fêr bibin û ramanên xwe derbirînin, her wiha sazî û dezgehên ku bi kar û barên çandî û nivîskariya wêjeyî ve mijûl dibûn ji bo piştgiriya ciwanan û têvedana wan ber bi qada nivîsîna bi zimanê Kurdî de ti bernameyên diyar û bi bandor pêşkêş nekirin. Lê di pêvejoya şoreşa Rojava de û piştî destpêkirina perwerdeya bi zimanê kurdî ji bo hemû astên perwerdeyê, êdî nifşê ciwanan serwextî zimanê kurdî bû her wiha der barê çand û dîroka wêjeya kurdî de têra xwe bûne xwediyê agahiyan. Di rewşeke wiha de pir pêwîst bû ku ji bo ciwanan platformeke derbirîn û afrêneriyê were lidarxistin.

Ji xwe tê zanîn ku pêşbirkên wêjeyî ji bo afirînerî û jêhatîbûna di nivîsandina wêjeyî de têvedaneke xurt pêk tîne û dibe sedema pêşketina civata wêjeyî bi giştî.

Pêşbirkên wêjeyî balê dikşîne ser berhema wêjeyî û derfetê dide ku ew berhem bêhtir were xwendin, ev jî dihêle ku ezmûna nivîskar di warê pêşdebirina nivîsa xwe de bihêztir bibe û li ser karê xwe bixebite da ku xelatan werbigire. Yek ji armanca pêşbirkan jî danasîna berhemê ye û bilindkirina nirxa wê ya wêjeyî ye.

Ji ber van sedema HRRK`ê weke erkekî da ser milê xwe ku vê derfertê li ber ciwanan veke û salane ji bo wan meydana nivîsîn, rikberî pêşbirkê veke. Komelaya Janê Xelef ya Xêrxwaziyê jî bi dilekî germ pêşwaziya vê projeyê kir.

Salên berê xwediyên sê helbestên herî bedew û baş dihatin xelatkirin. Lê îsal bi boneya 5 saliya pêşbirkê, hem HRRK`ê û hem jî Komeleya Janê Xelef biryar dan ku 5 helbestan xelat bike. Deriyê pêşbirka îsal weke her sal di 1`ê meha Çileyê li pêşiya ciwanan hate vekirin, diviyabû ku 10'ê Adarê deriyê beşdariya pêşbirkê were girtin, lê ji ber rewşa awarte ya li Sûriyê bi giştî û li Rojava rû dan piştî hilweşîna rejîmê, komîteya Amadekar biryar da ku dema rêkirina berheman heta 2`ê Adarê were dirêjkirin.

Komîteya nirxandina helbestên pêşbirkê dest bi karê nirxandinê kir. Komîte ji kesên di warê nirxandina helbestan pispor in pêk tê. Tê payin ku komîteya nirxandinê roja 29`ê Adarê ku roja jidayikbûna çalakvan Janê Xelef e, di civîneke çapemeniyê de encamên pêşbirkê ragihîne.

# Berxwedana Hefteya Lehengiyê çirûska azadiya gelê kurd e

Pêşengên Tevgera Azadiya Kurdistanê, ji 21 heta 28'ê Adarê navê xwe di dîoka têkşênê de dane nivîsandin û dîrok dane guhertin. Ew zarokên gelê Arî bûn, Ji gelê xwe re xizmet kirin û heta roja me ya îro bi rihê wan têkoşîna azadiya Kurdistanê didome.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Rojên di navbera 21-28'ê Adarê ji aliyê gelê Kurdistanê wekî "Hefteya Lehengiyê" tê pêşwazî kirin. Lewra her rojek ji vê hefteyê wedî dîrok e. Pêşengên Tevgera Azadiya Kurdistanê Mazlum Dogan 21'ê Adarê bi çalakiya xwe pêvajoyek nû da destpêkirin, fermandarê efsaneyî Mahsum Korkmaz (Egîd) jî rengê têkoşînê diyar kir û 28'ê Adarê şehîd bû.

Bi sedê sala ye Kurdistan hatiye dagîrkirin û talankirin, li ser gelê wê jî gelek komkujiyan pêk hatiye. Dagîrkeran gelê Kurd paşguh dikir wan tune didîtin. Lewra ji ber siyaseta wan ya li dijî mirovatiyê gel bê bawerî hat hiştin, rê li ber pêşxistina wan nehatibû hiştin. Di sedsala 20'an de çirûsekeke nû pê ket û rûpelek nû ya dîrokî hat vekirin.

Yek ji van dîrokan "Hefteya Lehengiyê" ye. Di vê hefteyê de pêşengên tevgera azadiyê bi çalakî, têkoşîn û berxwedana xwe pêvajoyên nû dane destpêkirin û mohra xwe li dîrokê xistin. Ji bo bi destxistina destkeftiyan bi sedan şoreşger di vê hefteyê de şehîd bûn.

Bi damezirandina Partiya Karkerê Kurdistan (PKK) ê ku di 27'ê Mijdara 1978`an de bi pêşengiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re, guhertinên dîrokî li Kurdistanê pêk hatin. Êdî têkoşîna jiyanek azad û wekhev hat destpêkirin. Bê goman bi destpêkirina vê têkoşînê re û heta roja îro, gel rastî gelek zor û zehmetiyan tên û bedelên giran jî hatin dayîn. Lê bi saya vê têkoşînê, rê li ber destkeftiyan hat vekirin û bawerî hat avakirin.

Mazlûm Dogan sala 1955'an li gundê Teman yê girêdayî navçeya Mazgirt a Dersimê ji dayik bûye. Piştî dibistanên seretayî, navîn û amedeyî, li bajarê Balikesîr ê Tirkiyeyê dibistana mamostetiyê Tirkiyeyê xwend. Sala 1974'an li beşa Ekonomiyê ya Zanîngeha Hacettepe ya Enqereyê nave xwe tomar kir. Di sala 1976'an de tevli koma îdeolojîk a Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) bû. Di 30'ê Îlona 1979'an de ji aliyê desthilata Tirk ve hat girtin.


21'ê Adara sala 1982'an yek ji damezirînerên PKK'ê Mazlum Dogan li zindana Amadê ku yek ji zindanên herî xirab ên cîhanê ye, dijî îşkence, zulm û polîtîkayên tunekirinê bi 3`ê darikên kîbrîtê çalakî li dar xist û newrozeke nû da dstpêkirin.

Li pêşberî dadgeha leşkerî ya dewleta Tirk li Amedê Mazlûm Dogan bi dirûşma "Berxwedan jiyan e" bang kir ji wê demê ve, ev bûye dirûşmeya tevahiya Kurdan û tevayiya gelê azadîxwaz. Mazlûm Dogan ji hevalên xwe re sembola têkoşîn û berxwedanê bû. Dogan bandor xwe ya têkoşîna bîrdozî û rêxistinî li ser girtiyên siyasî yên ji fikrinên cuda jî hebû.

Mazlum Dogan bi sê darikên kibrîtê roja 21'ê Adara 1982'an de çalakî li dar xist, ango mîna roja Newrozeke nû û dîrokî nivîsand. Lewra wekî Kawayê Hemdem hatiye binavkirin.

## `Li pêşberî zordaran wê Kawayên Hemdem jî hebin`

Mazlum Dogan li pêşberî zordaran gotibû: "Li her devereke ku Dehakên zalim hebin wê Kawayên Hemdem jî hebin" piştî vê gotina



Ş.Mazlum Dogan Newrozeke nû geş bû. Herwiha Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî li ser mijarê ev nirxandin kiribû: "Newroz ji niha û pê de wê bi du navan were bibîranîn. Newroza yekê bi navê Kawayê Hesinkar. Ev Newroz zayîna gelê me, pêşveçûna ber bi serxwebûn û azadiyê ve, efsaneya berxwedana bi rûmet ya dijî kesên vê pêşveçûnê asteng bikin, tê bibîranîn. Newroza duduyan jî ewe ku rêhevalê me Mazlum ji bo têkoşînê cane xwe feda kiriye."

## Rojên dîrokê

Mahsûm Korkmaz (Egîd) sala 1956'an li navçeya Farqînê ya bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê jidayik bûye. Sala 1976'an bi rêya Mazlûm Dogan Tevgera Rizgariya Kurdistanê nas kir û dest bi perwerdeya îdeolojî û siyasî kir. Mahsûm Korkmaz yek ji damezrînerên Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) û pêşengên Pêngava 15'ê Tebaxê ya 1984'an ku têkoşîna çekdarî li dijî dewleta Tirk ya dagirker hat destpêkirin bû. Herwiha roja 15'ê Tebaxa 1984'an koma gerîla ya bi navê "14'ê Tîrmehê" bi pêşengiya fermandar Mahsum Korkmaz (Egîd) li navçeya Eruh (Dihê) ya Sêrtê dijî bargehên leşkerî yên dewleta Tirk çalakiyek serkeftî pêk anî û şerê çekdarî jî dan destpêkirin. Ev roj jî di dîroka Kurdistanê de rûpelek nû vekir û li cîhanê deng veda, lewma gelê Kurd 15`ê Tebaxê wekî "Cejna Vejînê" dadikevin qadan û bi çalakiyên cûda vê rojê pêşwazî dikin.

Fermandarê efsaneyî Mahsûm Korkmaz ku bi rêhevalên xwe re di rûpela nû ya dîrokê dest bi têkoşîn kir. Fermandar Egîd 28'ê Adara 1986'an di şerekî li hemberî artêşa Tirk a dagirker ê li çiyayê Gabarê de şehîd bû.

Li ser şehadeta Fermandar Egîd Rêber Abdullah Ocalan jî wiha gotibû: "Rêheval Egîd fermandarekî dizanî ku pêwîst e Newroz bi hêviyên mezin bên pêşwazîkirin. Ew bi xwe jî di vê zanebûnê de bû û bawer dikir ku di şertên herî zehmet de dikarin gavên mezin ên nayê hejandin biavêjin. Bi vî rengî diyar kir ku taktîka partiya me wê bikeve jiyanê û bibe mînak. Ew di heman demê de ji bo diyarkirina qedera gerîla, gelê me û têkoşîna me ya çekdarî jî fermandarekî ku rewş zû ferq kiribû."

Li aliyekî din jî ji Fermandarên YJA Starê Emîne Erciyes di 28`ê Adarê 2020 Hefteya Lehengiyê, lehengî û Egîdbûn ji ANF'ê re ev nirxandin kir. Fermandar Emîne Erciyes destnîşan kir ku di dîroka berxwedanê de lehengiyên derketin holê ruheke fedayî yê nû derxist û bal kişand ser milîtanên jin ên di têkoşîna azadiya Kurdistanê bû fedayî û leheng û ev nirxandin kir: "Her çendî Hefetya Lehengiyê ji Mezlûman bigire heta Egîdan tê girtina dest jî lê di nava bê hefteyê de bi taybet divê jinên berxwedêr û leheng jî bên bibîranîn. Zekiye Alkan li dijî teslîmyeta li Amedê dihate ferzkirin bi gotina; 'Amed wiha li ber xwe bide' li ser sûrên Amedê agirê Newrozê bi bedena xwe pê xist. Li peyv êv Rehşan Demîrel li Kadîfe Kale ya Îzmîrê çalakiya xwe ya mezin pêk anî. Her wiha Ronahî û Bêrîvan jî li Elmanyayê dest dan destê hev li qiraxa çem rawestiyan û peyama 'Li gel me çem jî bi herike, eger ku azadî nebe em ê xwe bi agir paqij bikin' da. Ronahî û Bêrîvan berdêlên azadiyê ne. Ev çanda berxwedanê bi Sema Yucel jî dom kir. Em dema li vê dinêrin dibînin ku ruhê lehengiyê bi demê re fedayîtiyê di afirîne. Bi vî awayî PKK'ê ruheke nû afirand, qehremaniyek nû û cesaret derxist holê.``

Di têkoşîna azadiyê de ev herdû dîrok wekî gelek dîrokên din gelekî girîng in. JI ber vê yekê PKK'ê jî di kongreya xwe ya sisiyan ya (1986) biryar girt ku rojên di navbera 21-28'ê Adarê wekî "Hefteya Lehengiyê" bê binavkirin û pêşwazîkirin.

Bi vî rih û moralî gelê Rojava bi hemû pêkhateyên xwe Şoreşa xwe ya 19`ê Tîrmeha 2012`an dan destpêkirin. Bi saya vê felsefeyê û xwîna şehîdan, gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek destkeftiyên bi nirx bi dest xistine. Mirov dikare bêje rûpela ku Mazlum Dogan û Mahsum Korkmaz verkî, berdewam kir û bidestkeftiyên dîrokî têde têne nivîsandin.





# 'Hevpeyman bi daxwaza gelan pêk hat'

Şêwirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiya Kurd anî li ser ziman ku ev hevpeyman li ser pêkanîn û daxwazên gel ji bo aramiya herêmê hatiye kirin û wiha got: "Li ser xalên hevpeymanê piranî lihevkirin pêkhat."

**Argêş Viyan/ Qamişlo**

Derbarê rêkeftina hûrguliyên hevpeymana di navbera Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî û Serokê Hikûmeta Şamê Ehmed El Şera de 10'ê Adara 2025'an hatibû imzekirin. Girêdayî naveroka hevpeymanê Şêwirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiya Kurd bersiva pirsên rojnameya me da.

**10'ê Adara 2025'an de li paytexta Sûriyê Şamê di navbera Fermandarê QSD'ê Mazlum Ebdî û serokê desthilata Şamê Ehmed El Şera de hevpeymanek hat îmzekirin. Hûn naveroka wê peymanê çawa dinirxînin?**

Rêkeftina di navbera herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Şamê de, di encama çend civîn û şêwiran de pêk hat. Di dîroka Sûriyê û tevahiya herêmê de destpêka qonaxeke nû ye. Şert û atmosfera destpêkirina muzakere û aştiya li hemû Sûriyê ava dike. Ev lihevkirin dê hemû gelên Sûriyê, bêyî cudahî ji pêkhateyên xwe, bihêle ku diyalog û rêyên aştiyane yên danûstandinan û qebûlkirina yên din bipejirînin, ku dê rihê beşdarbûn û demokratîk di civaka Sûriyê de bi giştî geştir bike.

Di peymanê de bi awayekî giştî hatiye destnîşankirin ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşek ji Sûriyeyeke yekgirtî ye û ev yek jî bi nêrîna hemû gelê Sûriyê re ye. Hewldana me ya berdewam ji bo belavkirina çanda diyaloga Sûrî-Sûrî û teqezkirina li ser riya niştimanî ji bo çareserkirina nakokiyan piştrast dike, berevajî tiştên ku di medyayê û odeyên girtî de dihatin belavkirin ku em dixwazin ji Sûriyê cuda bibin an tiştekî mîna wê. Ji ber vê yekê, îro herêma me bûye kevirê bingehîn di mekanîzma û pêkhateya avakirina desthilata Sûriyê ya nû de, ku wê piralî û nenavendîbûnê bipejirîne. Em ê bibin hêzeke bingehîn di pêşxistina guhertina demokratîk û xistina civaka Sûriyê ya guftugoh û guhertina hişmendiya heyî.

Di çarçoveya peymanê de, em hewl didin ku mafên hemû pêkhateyên gelê Sûriyê bi taybet gelê Kurd garantî bikin, ji ber ku ew di civaka Sûriyê de wek gelê



resen tê dîtin. Piştrastkirina beşdariya her kesî di amadekirina destûra nû ya Sûriyê de bi awayekî ku mafên her kesî piştrast bike û avakirina Sûriyê di warê siyasî û îdarî de. Bê guman herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyêwê xwediyê taybetmendiyekê be ku wê bikaribe xwe di warê siyasî û îdarî de birêve bibe.

Em bi hêvî ne ku rêkeftin bigihêje qonaxa cîbicîkirinê û li ser hûrguliyan li hev bikin, da ku bibe modêlek ji bo belavkirina wê li tevahiya xaka Sûriyê. Nêrîna me ji bo sîstema hikûmeta nû ya Sûriyê ew e ku sîstemeke piralî be ku nasnameya Sûriyê ya berfireh û piralî îfade dike. Nûneratiya form û pêkhateyeke taybet a Sûriyê nake û şêwaza rêveberiyê sîstemeke nenavendî ye ku xwe dispêre rêveberiya herêmên demokratîk û girêdana wan bi navendê re li gorî mekanîzmayeke ku bi aliyan re li hev hatiye kirin. Ku nebe ev form dê nikaribe hemû pirsgirêkên Sûriyê çareser bike. Eger yek ji alîyan hizra birêvebirina dewleta Sûrîyê bi nêrîneke navendî ya yekta bike, ew ê ne bi tenê be, û dê bibe dûbarekirina rêjîma Baas, vegerandina Sûriyê bo heman serdema kevnar wê bi xwe re keraseteke mezin ji bo Sûriyê bi giştî bîne.

**Mekanîzmaya pêkanîna wê hevpeymanê wê bi çi şêwazî bimeş e?**

Mekanîzma cîbicîkirina xalên rêkeftinê û pêkanîna wê pêwîstî bi demê heye, lê gava yekem ew e ku kar ji bo ragihandin û cîbicîkirina rawestandina operasyonên leşkerî û şer li seranserê erdnîgariya Sûriyê, çi li bendava Tişrîn û pira Qerakozaqê û çi li ser berava Sûriyê. Ev erk pêwîstî bi hewldanên hevbeş heye û piraniya wê dikeve ser milê hikûmeta demkî ya Şamê. Herwiha hewlên hikûmeta demkî ji bo zextên li ser Tirkiyê bo rawestandina êrîşên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dabînkirina vegera hemû koçberên Sûriyê



bo deverên xwe, di nav de yên ji Efrîn û Serêkaniyê ku koçber bûne.

Îro li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêwîstiya me bi lidarxistina civînên ku hemû hêzên siyasî û pêkhateyên etnîkî û olî yên herêmê tê de beşdar bibin, bi armanca wergirtina nêrînên wan, destnîşankirina pirsgirêkên ku divê bên çareserkirin û pêşniyarkirina çareseriyan, li dar bixin. Li gorî vê yekê, komîteyên taybet dê bên avakirin, her yek ji wan komîteyên parastinê, komîteyên din ên aborî û yên din jî yên rêveberiyê. Em ê tekezî li ser wê yekê bikin ku ev komîte nûneratiya pêkhate û gelên herêmê dikin û kesên pispor di nav xwe de cih digirin da ku bikarin gotûbêjê bikin û nexşerêyeke guncaw ji bo danûstandina li gel Şamê û bidestxistina encamên berçav pêşkêş bikin.

**Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê li herêmên dagirkirî bi kiryarên xwe hewildidin aramiya herêmê têk bibin. Li gorî wê peymanê kesên ku ev biryarên ku hatine girtin pêk nayinin pêwîste çi were kirin?**

Ji aliyê Kurdan ve wê şandeyek ku ji hemû hêzên siyasî yên Kurd pêk tê li holê bin Erka wê şandê gotûbêjkirina pirsa kurdî û mekanîzmaya têkelkirina mafên kurdan di destûra nû ya Sûriyê de ye. Gotûbêja mafên gelê Kurd mafên pêkhateyên mayî betal nake, belkî jiyana piralî li Sûriyê geştir dike, emê piştrast bikin ku her pêkhateyek ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser parastin û garantîkirina mafên xwe di destûra nû ya Sûriyê de gotûbêj bike.

Heta niha xebatên ku di çarçoveya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dihatin meşandin, bi awayekî ferdî û ji Şamê veqetandî dihat meşandin, Lê piştî pêkanîna peymanê dê di rêveberiyê de parvekirin hebe. Bi taybetî dezgeh û wezaretên wekî berevanî, dîplomasî û aborî, ev beş wê li gorî mekanîzmayeke taybet bên parvekirin, yên mayî jî saziyên xizmetguzarî û sivîl ên wekî şaredarî, perwerde, çand û yên din li herêmê xwedî taybetmendî bin û ji herêmê bi meclîsên rêveberiyên herêmî yên demokratîk bên birêvebirin.

Em hîn di destpêka rê de ne û bê guman dê gelek kêşe ji bo cîbicîkirina rêkeftinê hebin, di nav de komên ku li piraniya erdnîgariya Sûriyê serdestin, bi pêşengtiya komên çekdar ên ser bi Tirkiyê ve. Kontrolkirin an bêçekkirina van koman erka sereke ya hikûmeta demkî ye. Yek ji xalên rêkeftinê jî vegera koçberên ji Efrîn û Serêkaniyê bo gund û bajarên xwe. Li vir divê hikûmeta demkî ewlekariya van kesan peyda bike û ev yek jî tenê bi kontrolkirina van aliyan û derxistina wan ji wir pêk tê û bi vî awayî van deveran ji aliyê gelê wê ve birêve were meşandin. Ya duyemîn jî, divê hikûmeta demkî bi hemahengiya Neteweyên Yekbûyî, bi zextê li ser aliyên herêmê yên bi serkêşiya Tirkiyê, ji bo ku destwerdanê di karûbarên Sûriyê de nekin û alozî û şerên di nav erdnîgariya Sûriyê de zêde nekin, beşdarî vê yekê bibe.

**Di hevpeymanê de girêdayî heremên dagirkirî û misogeriya vegera koçberan xaleke hebû, wê bi çi awayî ev yek were pêkanîn?**

Xalek taybet ji bo vegera awareyên Sûriyê ji bo deverên xwe heye û benda wê yekê me ku bi taybetî behsa rewşa xelkê Efrînê, Serêkaniyê, Girê Spî û hin navçe û gundewarên rojhilatê Helelê wek Til Aran û Til Hesel kir. Ev mijar ev demeke bûye mijara gotûbêja çend aliyan ji wan jî hikûmeta Şamê, Neteweyên Yekbûyî û hevpeymaniya navdewletî ya şerê li dijî DAIŞ'ê. Helwestên erênî bûn Berpirsiyariya herî mezin dikeve ser milê hikûmeta Şamê ku ji bo derxistina komên alîgirên Tirkiyê ji Efrînê bixebite û aramiyê li herêmê ava bike ji bo vegera xelkê. Ya herî girîng ew e ku şert û mercên vî gelî ji bo mafên xwe yên ku me li ser li hev kiribûn bi kar bîne.

Helwesta Şamê ji vê gavê heta îro jî erênî ye, lê wan demek ji bo rêkxistin û amadekirina şert û mercan xwest, lewma em li benda roja vegera koçberan li ser cih û ware wan re. Ev demek e bi rêxistinên navdewletî yên wek Xaça Sor û UNICEF re peywendiyeke berdewam heye ji bo hevrêzkirina hewlan û sazkirina mekanîzmayeke vegerê bi garantiyên navdewletî û erkê sereke ji bona vê yekê dikeve ser milê hikûmeta demkî ya Şamê

# Pêvajo, Fikar û Erk

**Sînan Cûdî**



Pêvajoya guhartin û veguhartina ku piştî Banga Aşitî û Civaka Demokratîk a Rêber Apo dest pê kir, derbasî qonaxeke nû bû. Li çar alîyên Kurdistanê di qadên Newrozê de gelê Kurd xwedî li vê bangê derketin û piştgirîya xwe bi Rêber Apo re ragihandin. Ev piştgirî û xwedî derketin, destpêkirina pêvajoyekî nû ye.

Bi ya min Newroza îsal, di aliyê hejmar û coşê de hemû newrozan li şûn xwe hişt. Peyamên ku ji qadên Newroz'ê belavbûn, ji niha ve mohra xwe li têkoşîna gelan xist. Bêguman coş, kêfxweşî û rêxistinbûna gel ji pêvajoya heyî nikare bê cuda kirin. Banga Rêber Apo, gotûbêjên Aşti'yê, guhartinên sîyasî yên herêmî û navnetewî asta têkoşîna kurdan jî dîyar kiriye.

Çawa ku Newroz destpêkirina bihar û sala nû ye, Kurdan jî her sal bi çalakîyên Newroz'ê ve stratejî û plansazîyên xwe yên têkoşînê eşkere dikin. Newroz ji bo Kurdan roja dîyarkirin û îlankirina têkoşîna sala nû ye.

Xuyaye, di vê pêvajoya girîng a dîrokî de hemû aliyên Tirkiye û Kurdistanê li ser naverok û asta têkoşînê ji alîyê xwe ve dinirxîne, niqaş dike. Asta polîtîk a gelê Kurd afirandiyê, çanda gotûbêjên demokratîk me mecbûr dike ku hemû hûrgilîyên heyî niqaş bikin. Ji ber ku gihiştina van rojan ne hesan bû. Gelê me gelek bedelên giranbuha dan. Heta van kelîyan jî li gelek alîyên welat şer, dorpêç û alûziya sîyasî û aborî li ser me qut nebûye. Lewma em divê bi tedbîr û hestiyar tevbigerin û bi rengekî berpirs nêz bin.

Hin derdorên ji nava gel û hêzên dost, behsa potansiyela xapandina Tevgera Azadiya Kurd dikin. Bang li Kurdan tê kirin ku ji bo bidestxistina hin mafan nekevin xefika AKP'ê û nebin navbeynkar di derbasbûna sîstemeke despotîk a AKP'ê de. Dîsa tekilî û danûstandina bi rejîma nû ya Şamê re jî heman fikar mijarê gotinê ye. Ev hişyarî û nirxandinên ku bi niyetê baş tê gotin, bêguman ji aliyê kurdan ve bi baldarî tê guhdarîkirin.

Lê, bi dîtina min ne mimkun e ku Tevgera Azadîya Kurd û Rêber Apo ku bi têkoşîna zêdetirî pêncî sal in di qada siyasî, leşkerî û civakî de nasnameya gelê Kurd daye naskirin, van fikaran nebîne. Lê di heman demê de rast e ku fikar heta radeyekê dikarin sûdmend bin. Em mecbur in tedbîrên xwe jî bigrin. Ruhê demê vê ferz dike. Jixwe, pêvajoyek pêşkeftî heye. Bi daxuyaniyên ku di Newrozê de hatiyê dayin pêvajo xistiye serdemeke nû. Ev heyama ku em ê têkevinê, dê ji her demê zêdetir berpirsiyariyê deyne ser milê her kesî.

Beriya her tiştî, ji bo ku pêvajoya aştiyê naverokek mayînde bi dest bixe, tiştên ku bên kirin hene. Divê Meclîs, rêxistinên civaka sivîl, rewşenbîr, hunermend, siyasetmedar û her kesên alîgirê çareseriyê, tevî hemû fikarên xwe, erka xwe ya di pêşketina bi tendurist a pêvajoyê de hebin û dizanin ku tu bijarteyek tune ku rola xwe negirin an xwe ji peywirê dûr bixin.

Teqez divê mirov teoriya bêçalakîtî û betaliyê neke. Kurd baş dizanin



ku çi dixwazin û çi dikin û berovajî îdiaya gelek kesan, ew ne tenê ji bo kurdan difikirin. Kurd bi destxistina mafên xwe yên wek hevwelatiyên welatekî azad û demokratîk tê wateya azadiya hemû dijber û mexdûrên sîstemê.

Her wiha nîqaşkirina tiştên ku pêvajo nû dest pê kiriye çi bi dest xistine an jî dê bi dest bixin nîqaşek e ku wê nebûna têkoşînê teşwîq bike. Dema ku hê jî di bin zextên giran ên sîstemê de ne, divê Kurd weke hêza bazarkirina ya wekhev neyê dîtin. Çawa ku heta îro em bi têkoşîn û berxwedanê mezinbûn, dê ji vir û şûn ve jî bi têkoşîn û berxwedan emê serbikevin.

Belê, Rêberê Apo weke mîmarê pêvajoyê di pozîsyoneke diyarker de ye, lê weke ku ji gelek tecrubeyên cîhanê jî tê dîtin, hewl dide pêşbînî bike ku encama pêvajoyeke ku bi zelalî wê gelek bilindbûn û daketinan bi xwe re bîne. Ango em dijminên gelan baş nasdikin û mûmkinê gelek rêbazên xapandinê û taloqkirinê pêş bixin. Lewma divê em ji bîr nekin, em çi bi dest bixin, ev bi têkoşîn tê bi dest xistin.

Lewma Tevgerê Azadîyê Kurd jî rayedar û fermandarên tevgerê jî tim hîşyarî didin ku em dev ji têkoşînê bernedin û xwedî li erkên xwe yên demê derkevin.

Ji ber van hemû sedeman, li kêleka geşbîniya bi tedbîr, divê mirov li kuderê beşdar bibe û heta çi radeyê beşdarî "pêvajoya têkoşînê" bibe, ku dê bi şêwaz, ziman û rêbazek nû pêş bikeve, were hesibandin.

Em ji Rêberê xwe bawer bin, li gorî perspektîfê wî tevbigerin û ji vê jî girîngtir bizanibin ku em îro çi bikin û çiqas têbikoşin, dê siberoj ewqas baş û aramtir be.

Bi vê munasebê ez hemû mirovên aşitî û demokrasîxwazên têkoşer silav dikim û dibêjim Newroza we dubare pîroz be...

# Komara Tirkiye li serhişkiya xwe qelibî!

**Volqan Elî**

Rast e ku dagirkerî, faşîzm û pergalên dijî civakan, dijî gelan, li dijî baweriyan tenê xwe diecibînin, ji xwe razîne! Dibêjin qey Xweda ew ji bo ku serweriyê ji cîhanê tevî re bikin, afirandine. Heqê ti mirovî tine ku bi zimanê xwe, bi çanda xwe û heta bi olê xwe jî bijî, îbadeta xwe, li gorî rêûresmên xwe bike. Hê çend deh sal ji beriya vê, wezîrê edaletê yê komara Tirkiyê Esat Bozkurt digot; "Ji derveyê qewmê Tirk heqê ti kesî tine ku li vî welatî bijî, eger hebe heqekî wan ew jî ew e ku bibin xizmetkarê Tirkan."

Na, em van tiştan ne ji bo ku komara Tirkiyê bi xwendekaran bidin naskirin tînin ziman. Hewldaneke wisa bi çend hevokan ne gengaz e jî. Jixwe ev komara han, bi qasî ku hewcedariyeke wisa zêde nebe, bi başî û xerabiya xwe (her ti başiya wê tine lê ji ber hevok wisa tê) li ber çavan e. Eger hebe nebe, tenê em dixwazin bi çend mînakan balê bikişînin li ser vê taybetmendiya wê: yanî serhişkî...

Hûn lê mêze nekin ku em dibêjin 'serhişkî'... Wekî me li jor anî ziman tenê pênaseyeke di zimanê Kurdî de ye û me hem ji ber wê û hem jî ji ber zimanê demê ev gotina 'nerm' bi kar anî. Naxwe ev Komar evîndarê serhişkiyên hê li pêştir e. Ji bo wê ne xem e, ku hinek wê bi hişkî pênase bikin. Berevajî, ji fikrê wê, ji emelê wê û her tiştê wê dijwarî, serhişkî, êş û azara li ser gelan (heta li ser gelê xwe bi xwe) difore.

Em zêde dirêj nekin: di van rojên dawî de Komara dagirker ya Tirkiyê rojeveke ku heta bi niha di kîsê xwe yê îhtiyadî de radigirt, anî di nava civaka Tirkiyê de teqand. Şaredarê Stenbol ê CHP'î xist zindanê û ji wezîfeyê girt. Çima niha? Bersiva wê dibe ku li gel komara malûm pir cuda be. Hezar hesabê Tayip û hêzên hegemonîk hebin. Em tam nizanin. Ya em dizanin çi ye? Rêber Apo nêzîkî mehekê ji beriya vê 'Bangawaziya Aşitî û Civaka Demokratîk' kir. Mirov bi rastî bêje, destpêkê ne ji aliyê dostan ve û ne jî ji aliyê dijminan ve tam nehate fêmkirin. Kurd û dostên xwe, destpêkê tam serwext nebûn jî, baweriya wan bi Rêber Apo temam bû. Aliyê din qet fêm nekir, bi taybetî dewleta Tirk wisa xuya dibe ku li gorî xwe, wekî berjewendiyên wê pê biqedin şîrove kiriye.

Hûn ê bêjin "çi eleqaya Banga Rêber Apo bi girtina şaredarê Stenbolê heye?". Wisa nebêjin, çawa ku taveke dijwar agahdarê baranê ye yan jî zivistaneke dijwar mizgîniya bihareke dîn û har e. Banga Rêber Apo rasterast bi girtina şaredarê Stenbolê re eleqadar e. Li Tirkiye hê wê gelek tiştên sosret çêbin. Em pir dirêj nekin, dema ku Bangawaziya Rêber Apo hat bihîstin, ya rast hem aliyê hember û hem jî Kurd û dostên xwe hema bêje, ji derveyê dilsoziya bi Rêber Apo re, bi heman tiştî fikirîn. Ji Erebîstana Sûdî bigir heta bi Îranê got "baş e, bila PKK'ê çekê xwe dayne û xwe fesih bike". Lê li aliyê din ve jî Kurd û dostên xwe jî gotin "temam lê ev ê çawa bibe?"

Bi kurt û kurmancî her du eniyan jî, ma pê nefikirî ku Rêber Apo, ev bang di serî de ji bo dewleta Tirk kiriye, ew bê çek kiriye; ji bo ku paşê pergala modernîteya kapîtalîst tevî bê çek bike. Beşa bi dewleta Tirk re eleqadar a plana Rêber Apo hêdî hêdî xwe dide der. Niha em ji ku derdixin ku ev bangawazî di serî de ji bo dewleta Tirk bû? Girtina şaredarê Stenbolê ji ser kar û xistina wî ya zindanê îşareta wê ye. Ji ber ku dewleta Tirk bê parastin maye êrîşê derdorê dike, êrîşê hêza herî lawaz dike. Hêza herî lawaz ku li ser serê wê komplo bike, CHP ye. Naxwaze ti kes, ti hêz ji bin kontrola wê derkeve. Lewra İmamoglu û hin derdorên welatparêz di çarçoveya 'lihevkirina bajaran' hin xebat meşandibûn û hin şaredarî xistibûn destê xwe. Ku ev jî li gorî qanûnên Tirkiyê bûn. Lê ev hin bahane ne, AKP wan dide pêş. Ev destpêkek e, ne dawî ye. Ji ber xwezaya dewleta Tirk, wekî kulmeke ji pola ye, bi vê pir pesna xwe dida, tê de nermbûn tine, hê wê serê xwe li gelek teht û zinaran bide.

Hê Rêber Apo jî nû ve dest pê kiriye, di gava destpêkê de hovekî wekî dewleta Tirk qefilandiye, xistiye nava kîsekî ji pembo. Lê belê ji ber ku pir serhişk e, pir aloz bûye çû xwe li partiya CHP'ê qeliband. Hê em nizanin ji giregirên wê, dilê kê çend saxlem e. Xweda ya xirê bike!...



# 'Pêwîst e dewleta Tirk di warê çareseriyê de gavên pratîkî bavêje'

Rojnamevan Rohat Bulut diyar kir ku ji bo demokrasî û çareseriyê pêwîst e dewleta Tirk guh bide banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha got: "Ya girîng ew e ku divê dewlet û desthilatdariya Tirk di warê çareseriyê de gavên pratîkî bavêje."

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Derbarê rewşa Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de rojnamevan Rohat Bulut bersiva pirsên me da û hevpeyvîn wiha bû.



**Piştî banga Rêber Apo ya ji bo aştiyê û civaka demokratîk, dewleta tirk heta niha tu gavên ber bi çav navêtine, tu vê rewşê çawa dinirxîne û dewlet pêwîste çi bike?**

Banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a Aşitî û Civaka Demokratîk" ji bo gelê Kurd û hemû gelên li Tirkiyeyê firsendeke dîrokî ye. Gelê Kurd, Tirk, Ereb û hwd ên li Tirkiyeyê dijîn bi kêfxweşî pêşwaziya banga Rêber Apo kirin. Her wiha ev bang ji bo hemû çand û baweriyên li Tirkiyeyê jî gelekî girîng û bi nirx e. Heke ev bang li ser bingehekê pêş bikeve dê herkes û her alî qezenc bike. Tu kes û aliyên ku winda bike tune ye, dê gelekî kêrhatî be. Ev ji bo dewleta Tirkiyeyê jî derbasdar e. Naxwe heke dewleta Tirk di ya xwe de israr bike û bi awayekî erênî ji vê bangê re nebe bersiv dê Tirkiye bi xwe winda bike. Niha em ji pêvajoya di navberên salên 2013-2015`an de jî baş dizanin. Wê demê jî pêvajoyeke li hev hatinê û diyalogê hebû. Di nav du salan de Tirkiye di Rojhlata Navîn de bû welatekî herî xweş û di her warî de geş bû. Lê piştî ku Serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan pêvajo bi dawî kir di nav deh salan de Tirkiye veguherî welatekî herî bê ewle, welatekî ji bo mirovan xeternak, di warê siyasî û aborî de têkçûyî. Di heman demê de piştî bi dawîbûna pêvajoyê, siyaset û polîtîkaya antî demokratîk a bi sedhezaran welatiyên Tirkiyê koçî welatên Ewropayê kir. Ew reva ji Tirkiyeyê hêj jî didome. Li aliyê din di roja me ya îro de qeyranên Cîhanî û bi taybetî yên ku li Rojhilata Navîn rû dide rê li ber xeteriyên mezin vedike. Pergala netewe dewletî êdî riziya, civak guherînên bingehîn dixwazin. Êdî israra di statîkoparêziyê de fêde nake. Li gorî ruhê demê pêwsît e dewlet jî xwe biguher e. Pêwîste dewlet û desthilat guh bidin daxwaz û bendewariyên gelan. Guherînan pêk bînîn, demokrasiyê pêş bixin û hem civak bi awayekî aştiyane bi hev re bijîn. Di roja me ya îro de ya ji bo Tirkiyeyê ferz jî ev e. Rêyeke din a li ber Tirkiyeyê tune ye. Lewre zora guherînê li ser Tirkiyeyê ye. Ya dê bi tundî yanî mudaxaleyeke ji derve dê Tirkiye xwe biguher e, yan jî dê bi xweşî bersiva "Banga Aşitî û Civaka Demokratîk" a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bide ku ji xeteriyan rizgar bibe. Mînaka, Filstîn, Lubnan, Suriye, Yemen, Misir, Tunis û hwd. li ber çavan e. Yanî bi kurtasî Tirkiye neçarî çareseriyê ye. Heke çareseriyekê pêş nexe, gavên şênber navêje dê ewê bi xwe mîna welatên din ên ku me navê wan rêz kir bibe. Aqilê dewletê bi xwe jî vê yekê dizan e. Lewma jî ev nêzî salekê ye bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinên çareseriyê dike. Lê xuyaye hêj jî desthilat, derdorên ku ji şer, qeyran û aloziyan sûdê werdigrin, ên ku berjewendiyên wan di şeran de heye naxwazin aşitî, çareserî û demokrasî pêş bikeve. Niha jî ya xuya dike ev e. Lê belê wekî me got ji derveyî çareseriyê rêyek din a li ber Tirkiyeyê tune ye.

**Her wiha piştî girtina serokê Şaredariya Istenbolê Ekrem Îmam Oglum rewşa Tirkiyê aloztir bûye tu van bûyeran çawa dinirxîne û sedemên wê çine?**

Sedemên ewqas êrîş, girtin, binçavkirin, alozî û hwd. Ên li Tirkiyeyê ji ber nebûna hiqûq û demokrasiyê ye. Heger li gorî hiqûqa heyî jî tevgerînek hebûya dê ewqas binpêkirinên mafan pêşneketibana. Bi salan e gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê û bajarên Tirkiyeyê têkoşîna hiqûq û demokrasiyê dide, bi salan e ku gelê Kurd rastî hemû binpêkirinên mafan tê. Gelê Kurd tê girtin, kuştin, gundên wan tên şewitandin, malên wan tên şewitandin, bajarên wan hatin hilweşandin, daristanên wan tên şewitandin, ciwanên gelê Kurd bi xwe hatin şewitandin, hestiyên zarokên wan ji goristanan derxistin û birin li qeyarêyan binax kirin, dîsa hestiyên zarokên gelê Kurd di torbe û qutiyan de ji dê û bavê wan re şandin, destûr nedan ku gelê Kurd cenazeyên zarokên xwe binax bikin û şûna xwe bigirin û van kiryarên bêhiqûqî û dijmirovî mirov dikare zêde bike. Lê ev mînakên ku me da rewşa nebûna hiqûqê ya Tirkiyeyê radixe berçavan. Belê dema vana diqewimî aliyê Tirkiyeyê temaşe dikir. Dîsa dema vîna gelê Kurd desteser kirin û siyasetmedarên Kurd avêtin zindanan gelekan lê Temaşe kirin. Lê li cihekî ku hiqûq tune be dê her kes para xwe ji binpêkirinên mafan bigir e. Îro tişta ku li dijî CHP`ê û şeredariyên wê pêş dikeve ji ber bêdengiyên wan ên demên borî ye.

**Ji bo ku li Tirkiyê demokrasî çêbibe û çareserî pêkwere, ji bo ku ev pirsgirêkên heyî çareser bibin pêwîste çi were kirin?**

Ji bo demokrasî û çareseriyê pêwîst e beriya her tiştî dewleta Tirk guh bide banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan. Pêwîst e bi gelê Kurd re li hev were û aştiyeke mayînde pêş bixe. Di serî de gelê Kurd hemû gel, civak, çand û baweriyên li vê erdnîgariyê bi mafên xwe yên xwezayî û mirovî bijîn. Dîsa pêwîste ku hemû mafên xwezayî yên mirovan bi qanûna bingehîn bê misogerkirin. Pêwîst dike ku bi guherîna makezagonekê her kes bigihêje mafên xwe yên demokratîk û civakî. Çareseriya vê yekê jî Rêber Apo pêş dixe û pêşniyar dike. Tenê ya girîng ew e ku dewlet û desthilat di warê çareseriyê de gavên pratîkî biavêje e.

## Civakên Rêxistinkirî dikarin demokrasiyê ava bikin

**Zekî Bedran**



Li Sûriyê rejima Baas'ê têkçû lê, rêveberiyekî demokratîk nehat avakirin. HTŞ ya ku niha li ser desthiladariyê ye, ne xwediyê feraset û bernameyekî ku bikare rêveberiyekî demokratîk ava bike ye. Ya xirab ew e. Nexwe avakirinekê rejîmeke nû niqaş û hewildanên wê dikare bê kirin. Ev normal e. Lê pirsgirêka mezin ev e ku hêza ku desthilatî girtiye li destê xwe bi zanebûn gel û hêzên hatine bi rêxistinkirin ji derveyi rêveberiyê dihêl e. HTŞ hewl dide ku li Sûriyeyê di nav qalibên teng ên mezhebî de desteser bike û bi rêve bibe. Li Sûriyê bingehekî wan ya girseyî tine bû. Berê hêzên wan tenê li Idlibê hebûn. Niha jî bi wê ferasetê û şêwazê dixwazin tevahiya Sûriyê birêve bibin. Ji bo vê jî hewl didin pêvajoya derbasbûnê heta ku ji dest tê dirêj bikin û xwe bi rêxistin bikin. Ji bo zagon û hilbijartinan demeke dirêj a çar-pênc sal danîne pêşiya xwe. HTŞ tenê bi biryara xwe vê demê diyar dike. Ew hêzên din ên li welat tevlî pêvajoyên biryargirtinê nakin.

DYA û welatên Ewropayê hemû hêzên li Sûriyeyê teşwîq dikin ku bi HTŞ'ê re peywendiyan deynin. Fêmkirina vê bi rengekî pir dijwar e. Ew bi fikar in ku ji bona HTŞ'ê dixwaze dewletek olperest ava bike û hem jî, ji lîsteya terorê dernaxin û ambargoyê ranakin, Sûriyê mehkûmî van dikin. Tê fêmkirin ku wan HTŞ wekî navnîşan dibînin, ji ber ku di vê demê de nekarîn alternatîfek din peyda bikin, lê nayê fêm kirin ku wan çavê xwe ji tiştê ku HTŞ dike re digirin. Mînak zagona demkî ya ku HTŞ'ê bi xwe çêkiriye û ragihandiye nayê pejirandin. Diviyabû hêzên weke NY, DYA û Ewropa li hember vê makezagonê helwest bigirtana. HTŞ ne xwedî armanceke Sûriyeya demokratîk e. Berovajî vê li dijî demokrasiyê ne. Ew ji Baasê zêdetir alîgirê hikûmetekî yêkdest û navendî ne. Gavên ku heta niha avêtine vê yekê têra xwe teqez dike. Dema ku hîn lawaz bin û piştgiriyeke girseyî nedin wan, ji lihevkirin û hevkariya hêzên din ên siyasî dûr dikevin. Dema ku ew bihêz bibin û welat bi dest bixin dê çi bikin, kêm-zêde dikare were payin kirin.

Niha Sûriye çawa tê birêvebirin? Rêveberiya vekirî û zelal nîne. Nîqaş ne gelemperî ne. Çapemenî ne azad e. HTŞ'ê dest danî li ser çapemeniya dewletê û bi yekdestiyekî ji Baasê xerabtir bi kar tîne. Ev çapemenî ji partî û nêrînên siyasî re vekirî nîne. Li welatekî ku çapemenî ne azad be azadî pêş nakeve û demokrasî ava nabe. Di vî warî de mirov nikare bêje ku Sûriye di nav dorhêlekî demokratîk de tê nîqaşkirin û birêvebirin. HTŞ di bin navê têkoşîna li dijî bermahiyên Baasê de li dijî Elewiyan komkujiyên eşkere dike. Hemû komkujî, sûcdarkirin û gef di bin navê bermahiyên Baasê de tên veşartin. Yên ku ne wek wan in, bi eşkereyî tên tirsandin û zext li wan tên kirin. Li dijî komkujiyên Elewiyan bertekên kêm be jî ji cîhanê derketin. Lê pirsgirêk tenê bi Elewiyan re sînordar namîne. Her wiha Elewî jî ji gef û komkujiyan rizgar nebûne. HTŞ'ê dev ji hişmendî û tûndiya xwe ya mezhebî bernedaye. Dema derfet û firsendê bibînin, ti bawerî nîne ku êrîşî Elewî û bawerî û pêkhateyên din nekin.

Hêzeke bi navê şoreşger be pêşengiya pêşketina azadiyan û avakirina demokrasiyê dike. Lê HTŞ lê dinêre ka dê jin li Sûriyê çawa porên xwe veşêrin û dê çawa wan bi şêwazên olî yên teng bisînor bikin? Civakeke ku jin azad ne be, çawa dikare azad bibe? Asta wekhevî û azadiya civakekê bi azadiya jinê tê fêmkirin. Eşkere ye ku HTŞ'ê li dijî maf û azadiya jinê ye. Ev yek bi têra xwe bi hevgirtina makezagonê û kongreya netewî ya ku wan li dar xistiye derketiye holê. HTŞ'ê di derbarê peywendiyên derve de xwedî siyasetekê zelal nîne. Wek mînak Ehmet Şara bi Rêveberiya Xweser re peymanek îmze kir. Xalek di wê de hebû ku gelê Kurd yek ji pêkhateyên bingehîn ên Sûriyê ye û mafên wî dê bi destûrî bên misogerkirin. Dewleta Tirk yekser wezîrên xwe şandin Şamê. Wezîrên Tirk gotin ku wan ji rêveberiya Şamê soz wergirtine ku di hevdîtinan de statû ji Kurdan re nayê dayîn. Di rastiyê de HTŞ'ê heta niha li dijî destwerdana Tirkiyeyê ya li hemberî axa Sûriyê û kiryarên wê yê dagirkirinê gotinek negotiye. Li hemberî herêmên ku Tirkiye dagir kiriye, ti helwestek wê nîne. Weke ku tê dîtin ev erd ji Tirkiyeyê re mane.

Eşkere ye ku HTŞ'ê ne xwediyê armanca ku demokrasî anîna axa Sûriyê ye. Di vî warî de hêzên ku li Sûriyê demokrasiyê dixwazin divê vê têkoşînê bimeşînin. Gelê Sûriyê nikare radestî hişmendiya mezhebî, paşverû ya HTŞ'ê bibe. Sûriye welatê gel û baweriyên cuda ye. Pêwîstî bi rêxistin û hevkirinên ku vê pirrengiyê hembêz bikin û rê li ber azadiyan vekin heye. Yên ku dixwazin li Sûriyeyê di nava ewlehiyê de bijîn, divê hikûmetek demokratîk armanc bigirin. HTŞ'ê hemû derfetan bi kar tîne û rêxistin dike. Hêzên rêxistinkirî ji xwe dûr dixe û dixwaze serdestiya xwe ava bike. Li hemberî vê divê jin, kedkar, rewşenbîr, bawerî û çandên cuda bi lez xwe birêxistin bikin.

## Rêbertî tiştek wiha ye!



**Farûk Sakik**

Li Îmraliyê tecrîd dewam dike. Çima? Di Newrozê de destûr nedan ku peyama Rêber Apo ya Newrozê were xwendin, lê, pêngava ku Rêber Apo bi navê 'aşîtî û civaka demokratîk' dabû destpêkirin li hember hemû astengiyan dewam dike.

Astengî ji aliyê Erdogan ve pêktên. Erdogan dixwaze vê pêngavê ji bo desthilatdariya xwe bikarbîne, diaxive lê di pratîkê de li gor rihê pênegavê tevnagere. Lê wisa dixwiye ku Rêber Apo ji bo Erdogan li chê sekiniye birê bibe. Bi dewletê re di nav nîqaşan de ye. Li gor nexşerêya pêngavê diviyabû gav bi gav rêwîtiyek hebûya.

Dewlet di nava rê de sekiniye û Ocalan ji wan dixwaze gavan bavêjin. Çi dixwaze? Dixwaze rewşa xwe ya destwerdana pêvajoyê (Telefon, internet, sekreterya, bi derve re kontakt, tevlîbûna TV û medyayê, sardana mêvanan, konakta bi rêxistinê re û hwd.) were sererastkirin. Dema ku van tiştan dixwaze, ji bo azadiya xwe ya şexsî naxwaze, ji bo gelê xwe dixwaze, rêbertî ev e....

Ji xwe ev soz hatibû dayin û di nexşerêyê de jî hatibû destnîşankirin. Ji bo ku gav navêjin sardana Îmrali hate rawestandin. PKK'ê jî ji bo lidarxistina kongreya xwe li benda tevlîbûna Rêber Apo ye. Ewê dewlet gav bavêje. Wê kongre kom bibe. Divê ku hinek wext bixwaze.

Lê tiştê herî girîng Rêber Apo bi vê pêngavê re bi vê serdema nû re di nav Kurdan de efektên yekîtiya netewî avakir. Di nav civaka Kurdan de ev yek êdî tê axaftin, ji xwe ji aliyê KNK'ê ve amadekariya Konferansa yekîtiya neteweyî tê kirin. Li çar parçeyên Kurdistan jinên Kurd jî ji bo 'konferansa yekîtiya jinên Kurd' amadekarî kirin. Daxwiyanî dan û Rojava ji vê Konferansê re malovanî kir. Pîrozbahiyên Newrozê yên îsal bi serê xwe eşkere kir ku banga Rêber Apo rê li ber avakirina yekîtiya neteweyî vekir. Kurd yekem care bi coşeke mezin bi tevlîbûneke mezin Newroza xwe pîroz kirin. Li tevahiya Kurdistanê û seranserî cîhanê, Newroz hat pîroz kirin.

Li hemû qadên pîrozbahiyan ji hemû rêxistin û partiyan, tevlîbûn çêbû û Newroza xwe bihev re pîroz kirin. Mînak pîrozbahiyên li Almanya li bajarê Kolnê!!!! Hin aliyan xwestin Newrozeke alternatîf organîze bikin, Kurdan ev niyeta wan vala derxistin û li gorî pêngava nû ya Rêber Apo tevgeriyan. Dema ku berbi vê pîrozbahiyê birêketin di niyeta wan de banga Rêber Apo ya yekîtiyê hebû. Di axaftinên kesên ji qadê û parvekirinên li ser mediya dijîtal de, me ev yek dîtin. Bi taybet di Newroza Stenbol û Amedê de ji her sal bêtir tevlîbûnek hebû. Rêber Apo bi vê banga xwe ya dîrokî pêşî li êrîşên dewletê, girt. Herweha Pîrozbahiyên Newrozê bi dewlêtê jî da qebûkirin. Di Newroza Amedê de jî efektên serdema nû hebûn...

Li wê qadê yekem carbû peyamên kesayetên cûda hatin xwendin. Bandoreke wisa li PDK'ê jî kiribû ku peyamên wan jî li qada Newroza Amedê bilind bûn. Rêbertî ev e. Rêber Apo serdemek wisa da destpê kirin, bandor li hemû civaê kir. Bandorek wisa kir ku wan ji şaştiyên wan vegerand. Li Rojavayê Kurdistanê pêşketinên nû çêdibin, ENKS û PYD'ê kom bûn û ji bo pêşeroja Kurdan biryar dan. Ji Başûrê Kurdistan şande ji bo piştgiriyê ber bi Rojava birêdikevin. Deng û peyamên ji qadên Newrozan bilind dibûn mafdariya hewldanên Rêber Apo yên serdema nû didan. Herkesî bawerî anî ku Rêbertî ev e.